



Bersîvên li ser pirsên mafên kesên ku dawxezkar û mafedarên parastina navneteweyî ne:

1. Wek Daxwazkarekê Penaberiye li Yewnanîstanê ev mafên we hene:

- i. Beyernameyekê daxwazkariya parastina navneteweyî didin we ji bo ku hun di nava welat de biqanûnî bigerin.
- ii. Mafê we ji bo pizêşk, derman û tedawiya bêmuçe heye.
- iii. Zarokên we dikarin herin dibistanan.
- iv. Li gor mercên ku li jêr hatine behs kirin mafê we yê sitarbûnê heye.
- v. Di bin hindê mercan de mafê we yê xebatê (şixêlê) heye.

2. Mafê we ji bo sitarbûnê tê derpêşkirin:

Daxwezkarên penahê (îltica) li gor qerarnamaya serokatîyê Q.S 220/2007 mafê wan yê sitarbûnê hene. Berpirsiyar Vezareta Kar û Xebatê ye. Servîsa penaberiye berpirse ku daxwazname penahan ya ji bo sitare (avahî, xanî) ragihîne (bişîne) li servîsa (xizmet gaha) berpirsiyar a Navenda Pêştgiriya Civakî ya Navteweyî (EKKA) ku bi Wezareta Kar û Xebatê ve girêdayî ye. Her çend mafê penaberan (kesên ku daxwaza îlticayê dikin) ji bo sitarbûnê hebin jî lê çî mixabin li mihvangehan (mihvanxanan) tenê 1.000 cîh he-nin û di encamê de ev jî têrê nake ku hemî daxwaz û lazimahî bînin tetmîn kirin. Li gor yasaya Yekîtiya Ewropayê (E.E) penaberên ku penahiya wan hatiye pejirandin (qebûl kirin) û yên ku xwedî alîkar in ji bo starbûnê (avahiyê) mafên wan tunînin.

3. Dewlet dikare ji bo me kar bibîne?

Helbet kesên penahî (îltica) xwestî û kesên ku xwedî parastina navneteweyî ne, dikarin bixebitin (bişixilin). Lê dewlet nikare ji bo wan kar û xebatê garantî (temînatê) bide, mîna ku nade hevwehatiyên xwe jî.

4. Ger ku li Yewnanîstan parastina navneteweyî (merteba penabertiye û alîkariya mi-rovatiye) bidin me ew ê çî mafên me hebin?

- i. Ew ê îcazeta rûniştandinê bêmuçe ji bo sê salan bidin we û piştê sê salan cardî dikare bê nû kirin. Piştê biryara erînî ya qebûlkirina daxwazname we, ew ê vê îcazetê di nav 1-2 mehan de bidin we. Heta hingê ew ê di destê we de beyannamekê (kaxezekê) parastina navneteweyî hebe ku li ser << ÎCAZETA RUNIŞTANDINÊ BERBENDÎ YE >> hatiye muhîr kirin.
- ii. Ew ê belgeyên seyhatê (rêwîtiyê) bidin we. Ji bo vê jî pêwîste hun daxwaznamayekê binivîsin û bi vî re jî 85 ewrû (pere) muçe razînin (bidin). Ger ku we ne penaberî lê belê we alîkariya mirovatiye girtibe û ger ku hun dikarin

pasaportê ji balyozxanên (konsolosên) welatin xwe bigrin, hingê hewcedariya we bi belgeya seyhatê tunîne ji ber ku hun dikarin bi pasaporta xwe seyhat (rêwîtiyê) bikin.

- iii. Ew ê mafê we yê xebatê hebe.
- iv. Ew ê li nexweşxanan mafê ew yê tedawîkirinê hebe.
- v. Zarok dikari herin dibistanê.
- vi. Ligel vê qasê dewlet cîhê sitarbûnê (avahî) nade û ne jî dikare mafê we yê kar û xebatê garantî (ewle) bike û ne jî cûrek mûça alîkariyê dide. Tenê ger ku kesek pirsgerêkeke cidî yê tendûrîstiyê û seqetbûneke cidî hebe hingê dewlelt mûça bimazeretiyê (seqetbûnê) dide.

5. Piştê ku biryara dayîna parastina navnetewayî (mafê penaberiyê yan jî alîkariya mirovatiyê) der keve, ji bo îcazeta rûniştandinê pêwîste ez kijan pêvajoyê bişopînim?

Piştê ku we ji Wezaretê me biryarnama wegirt, hun ê bi hemî belgeyên (ewreqên) ku ji bo sitandina îcazeta rûniştinê tîn xwestin re herin servîsa berpirsiyar a polîs (ΕΛ-ΑΣ) yanî li Mudiriyeta Biyaniyan, wan belgan razînin. (Navnişana vê Mudiriyetê ji bo Herêma Atînayê li odus (kûça) Petro Rallî No: 24 an e). Piştê 1- 1,5 meh ku we belgeyên xwe razandî, hun ê bîna îcazeta rûniştandinê xwe li servîsa me ya penaberiyê hildin (bigrin). Ji bilî vî hun dikarin rast e rast serî li daxwazkirina belgeya seyhatê (rêwîtiyê) jî bidin. Hewce nake ku hun benda îcazeta rûniştinê bisekinin heya ku der keve û paşê hun serî li dayîna belgeya seyhatê bidin. Hun dikarin herdu muamelan (kirarî) di heman demê de pevne bibin.

6. Gewremêr/jin dikarin herin dibistanê? Ew ê li kuderê fêrê (hure) zimanê yewnanî bibin?

Gewremêr/jin bi mercedarî (bi şertdarî) mafê wan yê perwerdê heye. Dewlet hindek deman ji bo wan perwedeya ziman pêşkêş dike (dide). Ji bo vê yekê hun ê ji aliyê servîsa penaberiyê, ji aliyê civat û komelên we û hem jî ji aliyê saz û dezgahên şarwer (sivîl) ve ku di vî warî de çalakin bi bilavokekê bîna agahdar kirin.

7. Em dikarin li hemî welatên Ewrûpayê seyhat bikin?

Ji bo ku hun bikarin bi qanûnî li welatekê Êwrûpa yê din seyhat bikin, ev muamele (kirarî) bi Peymana Dûblînê III, di nav çarçova yekdengiya malbatîyê ve hatiye tanzîm kirin ku daxwazkarên penaberiyê nikarin li welatên Ewrûpa yê din seyhat bikin. Tenê eger ku nexweşiyekê wan yê cidî hebe û pêwîste ku di heman demê de derkevin derveyê Yewnanîstanê.

Ger ku merteba penaberiyê yan jî alîkariya mirovatiyê bidin we, hingê hun dikarin daxwaznamekê bidin ji bo ku belgeya seyhatê bidin we. Hemî pêvajoya vê muamelê (kirarî) ji bo dayîna belgeya rêwîtiyê (seyhatê) 1-2 dajo. Bi belgeyên seyhatê ku

ew ê bidim we mafê we heye ku hun hemî welatên Ewrûpayê seyhat (bigerin) bikin, lê nikarin li wan cîwar bibin. Tenê hun dikarin ji şeş mehan carekê ji bo sê mehan bimînin lê piştê dema qedandina sê mehan dê pêwîste be ku hun ji wir veqetin (bê). Ji bo ku hun bikaribin li welateke Ewrûpa dayîmî (her tim) bimînin, divê li welateke Ewrûpa hevvelatiya we hebe.

8. Xweyî (xwedî) mafên parastina navnetewayî (penaber an jî kesên xweyî parastina mirovî) bi belgeyên seyhatê dikarin ji dervayê Yekîtiya Ewrûpa seyhatê bikin?

Kesê xweyî maf dikare lê belê ji baliyozxaneya welatê ku dixwaze seredanê bike, pêwîste îcazeta têketanê bigre (hebe) û kêmasî tişteke wiha tê daxwaz kirin. Ji bo vê yekê ew ê pêwîste bibe ku hun ê biçin ji baliyozxaneya welatê ku seredanê bikin pirsyar bikin û agahiyan wegrin.

9. Li gor peymana Dûblînê em bi kî re girêdayîne?

Zarokên neresît ku bê refaqetin dikarin bi dayî û bavê xwe re, bi xwîşk û birayên xwe re, bi mam (ap) û xalên xwe re û bidapîr û bapîrên xwe re bê girêdan.

Hevjîn (jin û mêr) di navbera xwe de.

Bav û dayîk ku xwedî zarokê neresît in.

Zarokên neresît (mînak: xweîş û birayên neresît, bav û dayên ku xweyî zarokên neresît) dikarin bi îmtiyazî wexta ku nexweşiyekê wan yê cidî hebe û kesekê pir kal û pîr ku hewcedarê xwedîkirina malbata xwe ye.

10. Pêwîste ji bo peymana Dûblînê çi kaxezên me hebin?

Ew ê pêwîste bibe bi we re kaxezên nîş didin ku kesekê malbata we li welatekê din yê Ewrûpa serî li daxwazkirina penahiyê (îltica) daye yan jî xweyî mafê parastina navnetewayî ye (yani penaber an jî mafdarê alîkariya mirovî be). Her çi qas zef kaxezên nîş didin ku xizimtiya we bi wî/wê kesê re heye hun wek delîl pêşkêş bikin dê gelek baş bibe.

11. Ger ku mafên penaberiyê bidin me, em çawan dikarin malnata xwe ji welatekê derveyê Yekîtiya Ewrûpa (Y.E) bînin li vir?

Xweyî navên penaberiyê mafên wan yê cardî bi malbatên xwe re bijîn heye û dikarin malbatên xwe ji welatên xwe (hevjîn û zarokên neresît) bînin. Pêwîst ku hun ji bo vê yekê bi daxwaznamekê ve serî li Servîsa (bîrû) me bidin. Ev pêvajoyê gelek dem û burokasî dixwaze, ji ber ku gelek servîsên din jî mîna Wezaretê Derve (xarîcî) tev li vî karê dibin û mirov nizane ku dê ev dem çi qas bajo.

12. Ew ê pêwîst bibe ji bo ku em malbata xwe bînin li Yewnanîstanê mal û karê me hebe?

Ger ku hun daxwaznama cardî bi malbatê re bijîn di nav sê mehên ku we pena berî girtiye de pêşkêş bikin hingê ev tişt (merc) hewce nakin(nelazimin).

13. Çi belge(ewraq) lazimin û em ê kîjan pêvajoyê bi şopînin (teqîp bikin)?

- i. Belgeyekê ku rewşa malbatê nîşan dide û di demekê nêzîk de hatiye tes Cîl kirin an jî kaxezekê (belge) fermî (resmî) ku ji aliyê meqamên Yewnanî yên berpirs ve li zimanê yewnanî hatine wergerandin û hatine tecîl kirin ku tê de rewşa(navnas) kesên malbatê yên ku bi penaber re tê girêdan.Yanî nav, pêş nav)navê malbatê),sala ji dayîkbûnê, cîhê ji dayîkbûnê û h.v.d. tê nivîsandin.
- ii. Tam fotokopiya (jibergirtin) begehên seyhatê (nasname,pasaport h.v.d.) yê endam an jî yên endamin malbatê.
- iii. Ger ku penaber ev belgeyên li jor hatin behskirin nikare bi dest bixe hingê berpirsyarên heyeta penahê(îltica) dê belgeyên din yên fermî (resmî) rakin ber çavan. Ji ber ku biryara redkirina (neyînî) daxwaznamê tenê bi van belgeyan (nasname, pasaport) ve nayê sitandin.
- iv. Piştê ku daxwazname (arezûhal, dîlekçe) ji aliyê Heyeta Berpisyar a Penahê hate pejirandin (debûl kirin) hingê balyozxana Yewnanîstanê ya li welatê penaber we ê vîzê (îcazet) bide malbata penaber ji bo ku bên li Yewnanîstan.
- v. Balyozxane ji bo ku ketina hidirê welat, vîzê (vise) bidin van tiştan daxwazdike:
- vi. Pasapor an jî belgeyekê (navnasekê) din yê seyhatê ku ji aliyê dewleat Yewnanî ve bê nas kirin û divê dema derbasbûna vê jî neqedabe û ji roja ku hatiye tescîl kirin pê ve dema debasbûna vê ji sê mehan zêdetir be.
- vii. Fotokopiya nûsafekê (rapor) qeyda sabiqeyê û belgeyekê rewşa cizaya daxwazkarê vîzê ji maqamên biyanî tên xwestin. Di vê rewşê de ji bilî cizayê, li biryara qethî (mîsoge) ya mehkem (dad) di navbera dewletan de tê mîsogerkirin ku ev sûç metitsîyê (tehlûke) çêdike ji bo nîzam û ewlekariya(asayîş) civakê û tê xwestin ku ev suçe gelek giranbe û ji zayîana xwe de tevgera wî îhlalkar be. Ji bo kesê welatê sêyemîn ev tên xwestin.

14. Bi îcazeta rûniştinê ku we dayî me, em dikarin li Ewrûpa seyhat bikin (bigerin)?

Na, belgeyên seyhatê (nasname, pasaport) jî lazimin.

15. Kesekê ku penaberiya wî hatiye pejirandi çî îmtiyazekê wî heye ji bo rewşên giran û babetên acîl dikare der keve derveyê Yewnanê?

Na, lê belê divê giranahî û acîlyeta rewşê îsbat bike ku cardî daxwaz nama wî bê berçavkirin.

16.Çend dem pêwîst dike ji bo çapkirina(dayîn) belgeyên (navnas,pasaport) seyha- tê wextê ku serî lê xistiye û penaberiya wî hatiye pejirandin?

Kêmasî 1 an jî 1,5 meh dajo.

17. Ez ji bo ku bikaribim hevvelatiya Yewnanîstanê wegrim çi lazime?

Mercên vê di madeyên qanûnî yê hevvelatiya Yewnanî de hatine dest nîşankirin. Bi kurtasî ji bo rewşa we ev tişt pêwîst in:

- i. Divê ku hun reşî bin (temenê weli ser 18 salan be)
- ii. Pêwîste ti suçê ku di madeya 5.mîna qanûna hevvelatî de hatine dest nîşankirin, we nekiribe.
- iii. Pêwîste ku hun wek penaber hatibin naskirin an jî xweyî belgeya parastina mirovatî yan jî hun endamê malbatekê penaber bin û pêre îcazeta rûniştinê he be (AΔET).
- iv. Kesê ku mîna penaber hatiye naskirin kêmasî sê sal û kesê ku wek xweyî parastina mirovî hatiye naskirin jî heft salan divê dayîmî li Yewnanîstan bijî.
- vi. Lazime hun zimanê Yewnanî baş fêr (hure) bin.
- vii. Pêwîste ku hun beşdarê jiyana welat a aborî û civakî ya bibin û bikaribin bi çalakî beşdarê jiyana welat a siyasî bibin. li gor medeya 5.mîn a qanûna hevvelatîyê.

18. Demên AΔET û belgeyên seyhatê çi qas dikêşe?

Dema AΔET ê sê sal û yê belgeyên seyhatê jî 5 sal in. AΔET piştê ku serî lê dana we ji nû ve dibe.

19. Ger ku dayîk û bav an jî xwişk û birayê me ku li derveyê Yekîtiya Ewrûpa dijîn, ji beriya ku em der kevin deveyê welat pevra dijiyan û kesekê wan tunîne ku li wan xweyî der keve, ji bo vî jî dikarin bêt li ba me û çawan?

Li gor hinek mercan penaberên reşî dikarin cardê bi malbata xwe re bibin yek. Ji bilî mercên ku li jor hatin behskirin ji bo cardê hevjiyandina malbatê ev tişt pêwîst in:

- i. Belgeyekê pesendkirî ji aliyê Sazûmanîya Dewletê ya Ewletiyê (IKA) ve bê wegirtin ku nîşan dide penaber tam seatan dixebite û dikare bi vî yekê pirsgerîka malbata xwe ya tendirûstî çarese bike yan jî:
- ii. Beyanameyek ji Baçxanê yan jî yekê din ku nîş dide derameta penaber sabît û dayîmî ye her wisa ku têra âborandina wî malbata wî dike. Divê ev deramet ne ji dewletê bê. Ev deramet pêwîste ku ne ji ya kar-

kerê bêvasif biçûktir be û divê ev rêje ji bo hevjinê %20, ji bo dayî û bav û zarokan jî %15 zêdetir be.

- iii. Peymana (kontrat) îcara malê yan jî ger ku xwedî malbe beyanama sitandina malê ji baçxanê hatibe pesent kirin û yan jî belgeyek ji aliyê dewletê ve pesentkirin ku penaber dikare malbata xwe bi xwe re sitare bike.

Bira û xwîş nikarin di eynî cîhê de bimînin.

20. Bi bînpêkirina kîjan qanûna ve penaber mafê xwe winda dike?

Bi libatên(çalakên) jêrê ve kesên xweyî parastina navnetewayîn e (penaber, mafdarên alîkariya mirovî) dikarin vî mafê xwe winda bikin: Cinayet (kuştin) an jî qebahetek (qusûrek) kiribe ku kêmasî bi cizayê sê salan tê hepiskirin. Her wisa ger kesekê jî giran birîdar bike madeya qanûnê(MQ.310), zarok revandin (MQ.324), revandina bêtniyaz (bêviyan) (MQ.327), xîret şikandin (MQ.337 bend 2-5), zarok xapandin (MQ.339), destavêtina zarokan (MQ.342), çêkirina pornoya zarokan (MQ.348A), xapandina zarokan bi amorên (hacetên) cinsî ve (MQ.348B), firotina jina, bi peran destavêtina zarokên nereşît û hereşe (tehdît) kirin (MQ.385).

21. Ger ku em kengî bixwazin dikarin ji statûya parastina navneteweyî (îltica yan jî alîkariya mirovî) der kevin?

Ji pêvajoya penahiyê (îlticayê) hun kengî bixwazin dikarin der kevin. Hem jî hun dikarin ji statûya penaberiyê yan jî xweyî alîkariya miroviyê der kevin. Ev tê vê menayê ku piştê devjiberdana van statûya pêwîste hun ji Yewnanîstanê der kevin. Hekene hun ê Yewnanîstanê bibin derqanûnî (qaçax) û ger ku hun bixwazin cardî serî li penhiyê (îltica) bidin ew ê daxwazname we gelek bi zehmetî bê pejirandin.